

## Hûn kengî beşdarî testa Vîrûsa Korona bûn (testa Kovîd-19)?

Piştî testa Kovîd-19, çend roj pêwîst dike ku encama testê amade bibe. Eger hûn berî ku encama testê bigirin nexweş bibin an pêwîstî bi lînêrîna bijîjkî hebe divê hûn bi bijîşkê xwe re têkilî daynin.

Her kesê ku guman dike ku tûşî koronavîrûsê bûye, divê bilez were test kirin. Nîşaneyên herî gelemperî pk tîn ji tay, kuxik, serêş, êşa qirikê, pirsgrêkên nefesê, an jî windabûna tama an bêhnê ye. Hin kesan tûşî nîşanên girantir dibin û dibe ku hinek jî hay jê tune bin ku tûşî nexweşiyê bûne.

Eger hûn di karantînayê de ne, eger bername Smittestopp ji we re hatiye gotin, an eger hûn bi nexweşiyê re rû bi rû bûne, pêwîste ku hûn testê bidin.

### Dema ku hûn li benda encamê disekinin divê hûn çi bikin?

Piraniya kesên ku beşdarî testê dibin, dema ku li bendê ne ku encama testê ne, neçar in ku li malê an jî di karantînê de bimînin. Beşdariya li dibistanê an li kar, li wesayitên çûnûhatina giştî, û li cihên giştî di vê demê de qedexeyê ye. Pêdivî ye ku hûn xwe ji yên din, bi taybet mezin û ciwanên ku hûn pê re dimînin, dûr bisekinin. Divê zarokên biçûk wek her carê werin lînêrîn kirin.

- **Eger hûn ji ber hebûna nîşanên Vîrûsa Korona hatine test,** divê hûn li malê bimînin û dema ku li benda encaman in ji kesên din dûr bimînin.
- **Eger ji ber nêzîkbûna ji kesek tûşîbûyî an jî li gorî ragihandina bernameya Smittestopp beşdarî testê bûne,** divê hûn dema ku li bendê ne ku encam bigirin li malê bimînin.
- **Eger hûn di karantîneya mecbûrî de ne,** divê hûn piştî destpêkirina dema karantînê û berî ku ev biqete testê bidin. Karantîne li gorî qanûnê pêwîst dike û eger hûn vê qanûnê neşopînin hûn ê werin ceza kirin. Kesên ku bi we re dimînin dê neçar bimînin heta ku encama testa yekem distînin, di karantîna li bendê mayî de bimînin. Di vê demê de jî divê hûn di karantînê de bimînin. Pêdivî ye ku hûn 7 rojan piştî têkiliya paşîn bi kesê nexweş re dîsa testê bistînin. Eger piştî 7 rojan test neyînî be, hûn dikarin karantînê biqedînin. Eger hûn testê nedin, karantîne piştî têkiliya dawî ya bi kesê nexweş re 10 rojan berdewam dibe. Eger tûşî nîşanên nexweşiyê bibin, hûn ê neçar bimînin ku dîsa testê bidin.
- **Eger piştî gihîştina Norwêcê hûn di karantînê de ne,** divê hûn hem dema gihîştinê û hem jî 7 rojên tam piştî testê beşdar bibin. Test û karantîne li gorî qanûnê pêwîst e û eger hûn pabend nebin hûn ê werin ceza kirin. Eger piştî 7 rojan test neyînî be, hûn dikarin karantînê biqedînin. Eger hûn bi kesên din re dijîn û hûn nikarin cudahiya fîzîkî rabigirin, divê di dema karantîna we de hevjinên we li malê bimînin. Eger tûşî nîşanên nexweşiyê bibin, hûn ê neçar bimînin ku dîsa testê bidin.
- **Eger hûn di karantînaya mecbûrî de bin û ji ber tûşîbûna nîşanên vîrusa koronayê beşdarî testê bibin,** divê hûn qaîdeyên tecrîdê bişopînin ji ber ku dibe ku hûn tûşî vîrûsa Kovîd-19 bibin. Qanûnên tecrîdê ji qanûnên karantînê diwartir in. Divê kesên ku hûn pê re dijîn di karantînê de bimînin heta ku encamên testa weya yekem bête zanîn. Pêdivî ye ku hevalên hevodeya we jî testê bidin.
- **Eger tevî ku we nîşanên vîrusa korona tune ne û bi kesek ku tûşî bûye re rû be rû nebûne,** ne pêwîst ku hûn li malê bimînin heta ku hûn encamên testê bistînin. Kesên ku ji ber beşdariya di projeyek lêkolînê de, serdana saziyek, an hebûna bernameya rêwîtiyê di testê de beşdar bûne jî bi vê rêgezê ve girêdayî ne.

## Çawaniya wergitina encama testê

Piştî 1-2 rojan, hûn dikarin encama testa vîrûsa korona di navnîşana Helsenorge.no (<https://www.helsenorge.no/en/test-results/>) de bistînin. Ev dem carinan hinekî dirêj dibe.

Hemî kesên ku xwedan jimareya nasnameya neteweyî ya Norwêcî an hejmarek D ne ku tê de hejmarek tîlefona destanyan yan navnîşana emailê di beşa hûnguliyên tîkiliyê (Kontaktinformasjon) malper helsenorge.no de bin, ew ê bi SMS an emailê encama testa xwe bistînin. Eger we jimareya nasnameya neteweyî ya Norwêcî an hejmarek D tune be, pêwîst e ku serdana navenda testê ya tîkildar an rêbernameya Korona yê li bajarê xwe re tîkilî daynin ku encam bigirin.

Eger we Vîrûsa Korona hebe, encam tê erênî yan pejirandî (positivt/påvist) be. Eger hûn tûşî vîrûsa korona nebin, encam tê neyînî be yan nepejirandî (negativt/ikke påvist) be.

## Eger test nîşan bide ku we Vîrûsa Korona heye (test erênî be)

Eger encamên testê nîşan bide ku we an zarokê/a we Kovîd-19 heye, divê hûn xwe karantîne bikin. Koma şopandina tîkiliyê li bajarê we dê bi we re tîkilî dayne.

Şopandina tîkiliyê ji bo pêşîgirtina li belavbûna nexweşiyê girîng e. Divê hemî kesên nêz (kesên ku hûn bi wan re dijîn û kesên ku hûn bi wan re di tîkiliyek nêz de bûne) werin karantîne kirin. Divê ev kes jî beşdarî testê bibin.

Pêdivî ye ku şaredarî rêzikên nepenîtiyê biparêze. Pêdivî ye ku di navbera we de tîgihîştinek hebe. Ji ber vê yekê, bi pirsan nezelaliyên xwe çareser bikin. Eger hûn ji zimanê aliyê din fêhmakin, hûn dikarin wergerekî bixwazin. Bikaranîna karûbarên wergerandinê belaş e.

Eger hûn di dema tecrîdê de nekarin ji hevalên hevodeyên xwe dûr bimînin, şaredarî dê alîkariya we bike ku cîhek din bo jiyana we bibînin.

## Pêşniyar û rêgezên tîkildarî karantîn û tecrîdê

- Pêşniyar û rêbazên tîkildarî karantîn û tecrîdê: <https://www.fhi.no/en/op/novel-coronavirus-facts-advice/facts-and-general-advice/social-distance-quarantine-and-isolation/>
- Pêşniyar û qanûnên karantîniyê bi zimanên cuda hatiye wergerandin: <https://www.fhi.no/en/op/novel-coronavirus-facts-advice/information-material/informasjon-different-languages/>
- Li gorî qanûna heyî, binpêkirina tecrîd û qanûnên karantînê dibe ku sûcek cezayî be.